

lingên min binêrin; a vay, ez im! Destê xwe di min de bidin û bibînin. Di pêrewekî de goşt û hestî nîne, lê hûn dibînin di min de hene.' Paşî ku vana got, dest û lingên xwe nîşan da. Ji şagirtên xwe yên ku ji ber kêfxweşiyê hê bawer nakin û şaş û metal mayîne re pirsra, 'Gelo bi we re tiştê xwarinê heye?' pirsî. Pariyek masiyê biraştî danê. Mesîh wê girt û li ber çavên wan xwar."

Kitêba Pîroz di derbarê Vejîna Mesîh de hê gellek carî agahiyê dide. Heta dibêje ku carekê ji pênc sed kes birayî zêdetir mirovan re, di heman demê de xuya bûye. Mesîh diji! Bo vê yekê bona her kesê ku pê baweriyê binin re hêvî heye. Ew, niha ji her kesî re wisa dibêje: 'A vay, ez li ber derî sekîni, li derî dixim. Ger yekî dengê min bibihîze û derî veke, ez ê bikevim ba wî...'

Bi vî awayî jiyaneke nû dest pê dike.

Rojek ji roja din re têdighîne ku jiyana min ber ve abadîniyek mezin rêwîtiyek e. Ey abadîniya xweş, divê dilê min hîn te bibe. Ji ber welatê min yê ras-teqîn ne li vê dinê ye.

Hûn dikarin pirsên xwe ji vê navnîşanê re binivîsin:

Hoffnung und Leben e.V.

Postfach 10 13 82

33513 Bielefeld

Germany

Kurdîsch (Wozu lebe ich?)

Çima dijîm?

Bi rastî jî ka me bersivê ji vê pirsra ku jiyana me dê bi xêr û xweşiyê ve dagire û di derbarê hatinê de me hêvîdar bike dîtine?

Ma gelo em tenê bona bixebitin, tama jiyane derxînin û paşê ku hinek jan û keseran kişandin, hinek kêfxweşyan dîtin pê de kal bibin û bimirin hatin vê dinê? Yanê gişt ev e? Na, divê wateya jiyane hê jî mezin û zêde be.

Belê, lê dê kî bersiva rast bide me? Mirovê herî zanyarê dinê be jî hew dikare li gora dîtina xwe bersiva rast bide me. Lê belê bersiva ku daye dê dîsa jî xelet be, ji ber ku tenê yê ku me afirandîye, yanê Xwedayê Bilind dikare bêje ka em bona çi dijîn.

Ka li ku Xwedayê Bilind dibêje ku em çima û çawa dijîn? Xwedayê Bilind di Kitêba Pîroz de ji me mirovan re bi awayekî aşkere daxwazya xwe gotiye. Ji ber ku Xwedayê Bilind bi rêya Kitêba Pîroz ji me, mirovan re diaxîfe.

Em dikarin bi navgîniya Kitêba Pîroz hîn bibin ka em çima hatine dinê û bona çi dijîn. Bi vî awayî divê em Kitêba Pîroz bixwînin û bersivên pirsên xwe yên di derbarê jiyana û hatina xwe de ji wê bixwazin.

Xelaskerê bilind yê dinê wisa dibêje:

“Ji ber, Xwedê ev qas ji dinê hezkir ku, Mesîhê xwe yê tekane da. Wisa ku, tu yên baweriyê bi Wî bînin mehnin, lê belê gişt bigihêjin jiyana bêdawîn.”

“Rê, rastî û jiyana ez im. Ger navgîniya min nebe tu kes nikare were Xwedayê bilind.”

“Bona ku tu yên baweriyê bi min anîne di tariyê de nemînin, ez wekî ronahî bim hatim dinê.”

“Vejin û jiyana ez im. Kesê ku baweriyê bi min aniye, ger bimire ji dê bijî.”

“Nanê jiyane ez im. Yê ku were min, tu carî birçî nabe, yê ku baweriyê bi min bîne tu carî tî nabe.”

“Ez şivanê qenc im. Şivanê qenc di oxira mîhên xwe de canê xwe dide.”

“Ez bona şahidiyê ji rastiye re bikim bûm, bo vê yekê hatim dinê. Her kesê ku ji aliyê rastiye ye, dê dengê min bibihîze.”

“Jiyana bêdawîn, bi nasîna te, yê Xwedayê rasteqîn û yekane ye, û Xelasker Mesîhê ku te şandî ye.”

Gava Mesîh hate daraz kirin çi bû?

Lê belê ji ber serîhildan û dijrabûnên me bedena Wî hate qulkirin, ji ber sûcên me Wî tahde dît. Cezaya ku bona xweşiya me bû dan Wî. Me bi birînên Wî şifa dîtîn.

Darazkerê wê rojê çawa ku got Mesîh bêsûc e, lê olperestên wê rojê darazkirina Mesîh xwestin. Olperestan wisa gotin: “Zagonek me heye, li gora vê zagonê divê Ew bimire.” Bi vî awayî kêma û zêde berî du hezar salî li cihê ku navê wê Golgota ye, Mesîh ji ber gunehên me hate daraz kirin.

Lê belê ev, ne ku bona wan mirovan dixwest wisa bû, ji ber ku Mesîh bona me xelas bike û bona xwe mîna qurbanekî pêşkêş bike hate dinê. Mesîh li gora daxwaza Xwedayê bilind kir û bona me mirovan xelas bike, xwe fida kir.

Ev Xelasiya mezin ya ku Mesîh pêk aniye, bona me mirovan gellek pîroz û girîng e. Ji ber ku Xwedayê bilind dê me ji ber gunehên me daraz bike. Lê hew bona ku Mesîh li dêvila me hate daraz kirin, ger em tobe bikin û baweriyaya xwe bi Mesîh ve binin, Xwedayê ewlekar û bi dad dê li gunehên me bibexşîne û me ji her xerabiyê ve pak bike. Kesê ku baweriyaya xwe bi Mesîh ve bîne êdî nayê daraz kirin, di ser de digihêje jiyana bêdawîn.

Mesîh Dijî!

Mesîh birastî jî vejîya û dijî. Piştî sê rojên ku ji ber gunehên me hate darazkirin û mir, ji şagirtên xwe re xuya bû. Lûqayê Nûjdar vê bûyera girîng bi vî awayî têdighîne:

“Dema vana digotin, Mesîh hate û di nava wan de sekinî. Ji wan re: ‘Bila xweşî ji we re be!’ got. Bizdiyana, wekî pêrewekî dîtibin ketin tirsê. Mesîh ji wan re, ‘Ma çima hûn qîlqîlîn? Çima gumanên wisa ji dilê we dizên?’ got. ‘Li destên min,